



2 **Hevpeyvîna "TISHK" TV,
Tevî Sekreterê Giştî Yê
PDK Îranê**



5 **Bizava Neteweyî A
Kurd Ji Nêrîna Dîroka
Siyasî Ve**



6 **Komkujiya Sergerê**



7 **Sinetkirina Keçan ...**



9 **Rojhilata Navîn**



11 **Rewşa Wêjeya Kurdî Li
Rojavayê Kurdistanê**



PDK Îranê Daxwaz Ji Xelkê Rojhilatê Kurdistanê Kir:

**"DÎ 19'HEMÎN SALVEGERA TERORKIRINA DR.
QASIMLO DE, DIKAN Û BAZARAN DABIXIN"**

► Komîsyona Teşkilat (Rêxistina Nepenî) a PDK Îranê di bangewazekê de, daxwaz ji xelkê Kurdistanê kir ku bi hinceta 22'ê Pûşperê (12'ê Tîrmehê), 19'hemîn salvegera terorkirina Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Şehîd Dr. Qasimlo, bona xuyakirina nerazîbûna xwe li hember kiriyara han a nemirovane, gişt dukan û bazaran dabixin.

Di bangewaza han de her wiha daxwaz ji xelkê welatperwer yê Kurdistanê hatiye kirin ku:

- 1- Di mal û cihê jiyana xwe de demjimêr 10'ê şevê bo heyamê 3 deqîqeyan çirayên mala xwe bitemirînin.
- 2- Roja 21'ê Pûşperê (roja îne 12'ê Tîrmeha 2008) kesên ku ji bo seyranê diçin, kincên Kurdî li xwe bikin.
- 3- Roja 22'ê Pûşperê, demjimêr 6'ê êvar, xelkê

welatparêz yê Kurdistanê bi kincên Kurdî herin ser şeqam û rêyan û bo heyamê seetekê li ser şeqaman bisekinin.

4- Xelkê akincî yê gundên Kurdistanê di roja 22'ê Pûşperê de bo bajarên hatin û çûnê nekin û di gundên xwe de bimînin.

Enternasyonala Sosyalîst:

"CHP Ne Partiyeye Sosyal Demokrat E"

► Enternasyonala Sosyalîst da xuyakirin, ji ber ku siyaseta Partiya Gel a Komarî (CHP) ya Tirkîyeyê bi siyasatên sosyalîst re nagunce, ji bo hişyarîdayînê, pêşniyarnamêyêk tê amadekirin.

Malpera CNNturk'ê aşkere kir, dibe ku Serokê Giştî yê CHP'ê Deniz Baykal neçe kongreyê 23'hemîn ya Enternasyonala Sosyalîstê.


Lê Baykal hêj beşdarîbûyîna xwe ji bo civînê diyar nekiriye û sedema vê yekê jî ji bo daxuyaniya Enternasyonala Sosyalîst tê vegeandîna ya ku dibêje

'CHP ne partiyeye sosyal demokrat e', ku bi wê hincetê kar ji bo hişyarîdayînê dike.

23'emîn Kongireya Enternasyonala Sosyalîst ku Baykal yek ji Cîgirên Serokê Giştî yê wê ye, di navbera 30'ê Hezîranê-2'yê Tîrmehê de li paytexta Yunanîstanê Atînayê dê bê sazîkirin.

Her wiha Akademîsyen û siyasetvanê navdar Prof. Dr. Baskin Oran, ji Sosyalîst Enternasyonalê re nameyek şand û ji wan daxwaz kir ku divê endametiya Partiya Gel ya Komarê-CHP bê betalkirin û ji Sosyalîst Enternasyonalê bê avêtin. Baskin Oran di nameya xwe de destnîşan dike ku li Tirkîyeyê partiya herî paşkevî û kevneperest, Partiya Gel ya Komarê-CHP ye.

PDK Îranê endamê Enternasyonal Sosyalîstê ye û bi şandeke payebilind dê beşdarî kongireya 23'emîn a vê rêxistinê bibe.



Hevpeyvîna Televîzyona “TISHK” Tevî Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê

Hevpeyvîn: Kerîm Perwîzî - Erfan Rehnîmûn

Kekê Mistefa, gellek sipas ji bo ku we dema xwe ji me re veqetand. Em ji politîka cîhanî

dest pê bikin. Ji ber hinek sedemên girîng, siyaseta cîhanê berdewam diguhere. Ew guhertinên ku li ser Îranê bandorê dikin kîjan in?

M.Hicrî: Di rastî de pîrsa sereke a siyaseta cîhanî li dor Îranê, heta niha jî her doza projeya Etomî û xebatên Îranê ji bo meyndina Uraniyûmê bi merema bidekstxistina çekên Etomî ye. Serbarê vê çendê ku di çend mehên borî de hinek aramî û bêpejinî derkete holê, ji ber vê yekê ku civaka navneteweyî dubare hewleke zaf da ku Komara Îslamî ji rêya gotûbêj û qanihkirinê ve razî bike ku dev ji zengînkirina Uraniyûmê berde û di derbarê vê pîrsê de, careke din hin pêşniyar ji bo heydana Komara Îslamî ku bi xwe navê “Paket”ê jê re danîne, pêşkêşî Komara Îslamî bikin, lewra rewş aramtir bûye, lê tu guhertinek di armanca de pêk nehatiye. Di vê derheqê de em dinêrin ku serbarê pêşniyarên gotûbêjan û îrsar û hatin û çûna dîplomaten YE'ê û welatên 5+1 di vê derheqê de, pîrsa gefxwarin ji Îranê jî di holê de ye. Di vê derbarê de, Ewropa û Amerîka rê nadin ku Îran bibe xwediyê Çekên Etomî. Lê Îranê jî heta niha bersiva na yê daye civata navneteweyî û li ser biryara xwe û bernamewên xwe ji bo meyndina Uraniyûmê bi îrsar e. Lewra niha careke din pîrsa cezayên din ku dibe cezayên çarem, ji aliyê civata navneteweyî bo ser Îranê di rojevê de ne. Niha bas jî baykutkirina bankên Komara Îslamî jî tê kirin.

Niha bi giştî dinya erxayîn bûye ku nabe Komara Îslamî Çekên Etomî bidest bixe, sedema vê yekê jî ew xirabkarî û maytêkirinên êşkere bûne ku di mehên vê dawiyê de xuya û eyantir ji berê ji bo civata cîhanî û nemaze Amerîka û Ewropayê re derketine holê.

Di çend mehên borî de, hinek guhartin di asta herêmê de çê bûne, bo minak em dikarin qala navberikirina Turkiyê di pîrsgirêka Sûriye û Îsraîlê li ser bilindahiyên Gulanê bikin û herwiha rûbirûbûna Malîkî, Serok Wezîrê Îraqê tevî girûpa Sedr û herwiha piroseya aştiya Erebb û Îsraîlê. Van guhartinane dê çi bandorek li ser siyaseta herêmî a Komara Îslamî hebe?

M. Hicrî: Ew xalên ku we qala wan kir, ew pîrsên girîng in ku di çend mehên borî de di Rojhilata Navîn de pêk hatine. Komara Îslamî a Îranê hewl daye ku



herdem ji xwe re girûp û destekan pêk bîne û ew hêzên ku di herêmê de di bin nifûz û bandora Komara Îslamî de ne û bi alfkariya Komara Îslamî a Îranê xebat û çalakîyên xwe didomînin, Îranê her gav hewl daye ji rêya wan şer, fitne û ne ewlehiyê di deverê de biafirîne û yek ji astengên herî mezin ên aştiya navbera Îsraîl û Filistinîyan bûye û di pîrsa Lubnanê de jî me dît ku bo heyamê zêdetirî 6 mehan hilbijartina Serok Komar di wî welatî de dereng ket û beşeke sereke a pîrsgirêka wê hilbijartinê, dikeve stûyê Komara Îslamî a Îranê û di heftiyên vê dawiyê de me dît ku Hizbulahê tevî aliyên hevalbendên xwe kudîtayek li dijî hikûmeta Fuad Sînyorê kirin ku hin welatan, nemaze Erebestana Seûdî ewa bi derbeya Komara Îslamî di Lubnanê de binav kirin. Niha wisa tê xuyakirin ku Rojava di vê fikrê de ye ku destê Komara Îslamî a Îranê di herêmê de kurt bike, bo vê pîrsê di hizra vê çendê de ne ku ew xalên Komara Îslamî ji wan bona şer û dubendiyê jî bo nifûza xwe mifah standiye, hêdî hêdî aram û hêmin bikin. Yek ji wan xalên girîng pîrsa aştiya navbera Îsraîl û Felestîniyan bû û vê dawiyê jî em dibînin ku Îsraîl tevî Sûriyê dest bi gotûbêjan kiriyê û navberkerê van gotûbêjane jî Turkiye ye. Îsraîl dixwaze hinek poenên erênî jî bide Sûriyê heta ku bi vî awayî Sûriyê di proseya aştiyê de bêtir beşdariyê bike.

Me dît ku civîna Duhayê bona çareseriya kirîza Lubnanê lihevhatinek di navbera aliyên pîrsgirêkê de îmza kir û encamek baş lê ket. Lê bi raya min pîrsa girîngtir, meseleya Îraqê ye. Di pîrsa Îraqê de, wisa

tê xuyakirin ku Amerîkayîyan ragihandiye di rewşekê de dê piştigiriya Îraqê bikin ku nifûza Îranê di nav Îraqê de kêmbikin. Me dît ku hikûmeta Îraqê hêzên çekdar û şerker ên Sipaha Mehdî û alîgirên Sedr serkut kirin.

Divê em vê yekê jî bizanibin ku Komara Îslamî a Îranê jî hemû hewla xwe dide ku ev gav negihîjin encamê. Ez bawer im ku ev siyaseta nû dê pêş bikeve û Komara Îslamî nikare siyaseta xwe a şer û aloziafirandinê bidomîne û roj bi roj dê jar û qelstir dibe û munzewî û terîkketina Komara Îslamî di astên herêm û navneteweyî de bêguman dê, bi vîc û qazancê xelkê aştiwxaz û di berjewendiya ewlehî û arambûna deverê de ye.

Hemû ew çalakîyên dîplomatik ên we bas kirin, hewldanek e ji bo kurtkirina destê Komara Îslamî di herêmê de, bi raya we çêtir nîne ku Rojava çavkaniya sereke hişik bike, ne ku tevî destek û girûpên ser bi vê rejîmê tevbigere?

M. Hicrî: Di vê derbarê de nêrîn cuda ne, renga me weke hêzeke Kurd a Opozîsyona Îranê, dîtî û nêrîneke taybet bi xwe hebe, lê renga hêzên biryarder weke Amerîka û Ewropayê jî nêrîneke din hebin. Bi hizra min politîka cîhanî a îro li dor Îranê, zêdetir pîrsa gotûbêj û nîqaş in bona ku bikarin bi nîrx û bihaya herî kêmbin pîrsgirêkan çareser bikin, dixwazin xalên ku şer û fitneyê çê dikin, aram bikin. Dixwazim li hember Komara Îslamî jî her bi vî awayî tevdiqerin.


Bi nêrîna min civata navneteweyî dê vê siyaseta pêşde dibe û bona vê çendê ku hêdî hêdî karîna û şiyana Îranê kêmbike û bêper û bask bike û heke Komara Îslamî di pêşerojê de wê siyaseta şer û fitneafirandinê bidomîne û berdewam piştigirîya terorê bike, renga birûnên û bir û fikrek din jê re bikin.

Kekê Mistefa, bi raya we tevgera Kurd bi giştî di hemû parçeyên Kurdistanê de, ji bo gihîştin bi demokrasî û mafê neteweyî di çî ast û qonaxekê de ye û li ser rêya vê tevgera rewşa û berbîpêş hûn çî derfet û astengan dibînin?

M. Hicrî: Heke em bi giştî mîzeyî rewşê di hemû parçên Kurdistanê de dikin, ez xalek hevbeş dibînim, ew jî berfirehbûna xebat û berxwedan li dijî totalîtarîzma wan hikûmetane ye ku bi ser Kurdistanê de desthilatdariyê dikin, ev yek di hemû parçeyên Kurdistanê de mijûlî xurtbûnê ye. Bona vê yekê sedem zaf in, lê heke bi kurtî bibêjim, ev rewşê vedigere ser pîrsa tîkiliyên lezgîn ku niha di cîhanê de xurt bûye û dema bizavek û berxwedanek di navçeyê Kurdistanê de weke berê nikarin bihêz dibe, li her derekê deng vedide. Hikûmetên serdest ên Kurdistanê weke berê nikarin Kurdistanê kavigil û wêran bikin, xelkê bikujin û li çî ciheke cîhanê pê nehesin, eva yek ji sedemên sereke ye ku di vê derheqê de pêk hatiye û alîkariyê jî dide vê pêvajoyê. Beşeke din jî vedigere ser hişyariya bêtir a xelkê, hişyariya neteweyî. Pîrr xwezayî ye, dema ku guhartin di cîhanê de çê dibin û cîhan ji her alî ve pêş ketiye, xuristî ye ku guhartin bi ser civaka Kurdewarî di hemû parçeyan de pêk bînin. Ez bawer im niha xebat û berxwedana Kurdan di hemû beşên Kurdistanê de gellek armancdartir, bawermendtir û bi tîdîtin û hûrbîniyê zêdetir pêşde diçe. Lewra gavên bêtir di vê derheqê de di rojevê de ne, civaka navneteweyî gellek zêdetirî caran li ser mafê neteweya Kurd bersivder e. Her çîqas hêj pîrsa Kurd nebûye dozeke cîhanî ku di hemû cîhanê de bas jê bihê kirin û navendên biryarder û Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li ser de bicivin û bi axivîn, lê aliyê kêmbûnê di asta navneteweyî de basa Kurdên Îraqê tê kirin, biryarê li ser didin û di pêxema ew guhartinê ku di Kurdistana Îraqê de derketine holê, alîkariyê diik.

Herwiha berxwedana gelê Kurd di parçeyên din ên Kurdistanê de jî bandor hebûye, weke NGO'yan, Rêxistin û Komeleyên Civakî, Jinan, Kedkar û Xwendekaran û wd. Eva hemû derfetên baş in ku em bikarin mifahê ji wan bistînin, lê serbarê vê çendê berbend û asteng jî hene, mixabin derbarê pîrsa Kurd û pîrsa neteweyî de tu guhartinek bi ser hikûmetên totalîtar de pêk nehatiye.

Komara Îslamî her ji roja destpêka bidevegiştina desthilatê derheq pîrsa netewî û mafê neteweyî de çawa difikirî, niha jî her wisa ye, li Turkiyê jî em her vê



yekê dibînin û li Sûriyê jî ew rewşê tê xuyakirin. Wekî min got guhartinek ku di vê pîresê de çê bûye, ew guhartin e ku di Îraqê de derketiye pêş. Lê serbarê vî halî derfet ji astengan zêdetir in, lewra ez pêşeroja xebata gelê Kurd û nêzîkbûn ji bidestxistina mafên xwe ên neteweyî ku hêja û kêrhatî wan mafan e, pîrr nêzîktir dibînim û hêvîdar im.

Hûn rewşa tevgera neteweyî di Rojhilatê Kurdisatanê de çawa dibînin? Helwesta PDK Îranê derheq tevgerên civakî ên weke Jinan, Kedkar û Xwendekaran ku di hundirê Kurdistanê de dixebitin çî ye? Bi raya we ev bizavane heta çî qas dê bikarin paşdekişyanê bi Komara Îslamî bikin?

M. Hicrî: Di Kurdistana Îranê de jî weke parçeyên din hinek derfet hene û hinek asteng. Ji bo derfetan ez dikarin bibêjim ku hêzên siyasî ên Opozîsyona Kurd di heyamê du salên derbazbûyî de rastî cudabûn û veqetiyanan hatine, lê serbarê vê yekê jî, her yek ji wan beşek ji xelk organîze kirine, ji bilî vê çendê, gelê Kurd di Kurdistana Îranê de bi ked, zehmet û tekoşîneke zaf û fidakariyêke bêbes karîne ji rêya rêxistin û komeleyên ne dewletî û serbixwe (NGO) û sinfî komek xelkê di dora xwe de bicivînin. Komara Îslamî ji hemû aliyekê ve dixebite ku wan rêxistin û komeleyan serkut bike, wan ji hevdu belav bike, kirêgirtiyên xwe têxe nav refên wan, lê bi xweşî ve çalakî û tekoşîna wan her dom dike.

Beşeke zaf ji çalakên komeleyên ne dewletî û sivilî niha ketine zîndanên rejîma Komara Îslamî, divê partî û hêzên siyasî û NGO û komeleyên hundirê welat bi alîkariya hevdu gel organîze û rêxistin bikin. Ez hêvîdar im veqetiyane nav partiyên siyasî ku du di salên borî de qewimîn, bibe

ceribînek da ku dubare cudabûn çê nebin, belkî pîrosesa ji hev nêzîkatî, bi hevdu re alîkarîkirin bihê dîtin.

Di yek du salên borî de siyaseta herdemî a Komara Îslamî tundtir û berfirehtir tê meşandin ku xelkê bo aliyê xwe rakêşîne. Nemaze di Kurdistanê de bi Besîckirina xelkê, dixwaze gel girêdayî xwe bike û gel neçar dike tevli Hêza Besîc bibin û wê dawiyê bi hemû awayî vî karî dike. Bi raya we ev siyaseta bo çî tiştêkê vedigere û gel divê çî bike?

M. Hicrî: Raporên ku di vê derbarê de gihîştine me, nîşana vê yekê dibînim ku Komara Îslamî xwe zêdetir di tîrsê de dibîne, ji ber vê yekê hewlê dide ku ew hêzên ku bi raya wê di roja lêqewimînê de dê piştigiriyê jê bikin, xurttir û hevgtirî bike. Berê jî heyamekê polîtîka Besîckirina xelkê hebû. Lê heta vê dawiyê bi awayê hewce ektîv û çeleng nemabû. Lê niha ku gef hem li hundir û hem ji derve re li ser Komara Îslamî a Îranê roj bi roj zêde dibe, Komara Îslamî dixebite wan hevgtirî bike û bi dana diraveke zaf wan bixapîne û li dora xwe kom bike û çekdar bike. Lê di rastî de nabêjim hemû, lê beşa herî zêde a wan ew kes in yên ku ji ber nebûna kar û dahatê li dora Hêza Besîc civiyane, ji bo ku debara jiyana xwe bikin û di roja tengayiyê de nabin piştevanên rejîma Komara Îslamî. Ez bawer im xelk berevaniyê ji Komara Îslamî nake, çûnkî vê rejîmê tu tiştêk ji bo xelkê nekiriye.

Dihat gotin ku PDK Îranê ji Kongireya 10 heta 13'an jar û passv bibû, di kongireya 13'an de biryar li ser guhartin û çelengkirina partiyê hate dan û eva armanca Kongireya 13'hem bû. Bi raya we Kongireya

Sêzdehem heta çi qasî karî bigihîje armancên xwe?

M. Hicrî: Kongireya Sêzdehem, kongira nûbûnê bû. Endamên beşdar di Kongireya Sêzdehem de, bi merema nûkirina Partiya Demokrat, hatin bo salona Kongirê û biryara xwe di vê derbarê de dan û bi zelal û eşkere dîtî û nêrînên xwe îlan kirin û ew karê ku diviya bihata kirin, dest pê kirin, yek ji xebatên girîng ên Kongirê guhartina dirûşma stratejîk a partiye bû, eva bi xwe gaweke mezin bû. Herwiha Kongirê dirûşma nûkirin û ciwankirina rêberiya partiye da, di vê derheqê de, Partiya Demokrat hin gav avêtin, hejmarek Kadro û Pêşmergeyên nav refên partiye karî bibin endamê rêberiya PDK Îranê. Cihgirkirina usûl, dîspîlîn û ser û beriya hewce di pêkhatiya partiye û çarçoveya kar û xebatên partiye de bû. Xurtkirin û berfirehkirina karê dîplomasî û pêwendiyên partiye di asta navneteweyî de, hêj gellek armancên Kongireya 13^{hem} bi cî nehatine û sedema wê jî ew nakokî û dubendiyên nava refên partiye de bû û asteng pêkanîna ew girûpa ku ji partiye veqetiyên, rê nedida ku em wan armancan pêşde bibin. Divêt em vê rastiye jî bizanibin ku beşek ji pirsgrêkê jî girêdayî bi wan kosp û astengan in ku li derveyî vîn û îradeya PDK Îranê ne ku wan jî bi xwe bandor hebûye ku me nekariye sozên xwe bi tevahî bi cî binin. Divêt em bona encamgehandina wan bixebitin.

Di heyamê borî de, di nav partiye Kurd ên dijberên Komara Îslamî ya Îranê de, çend veqetiyên û cudabûn çê bûn, bi raya we xisarên wan cudabûnan çi ne û partiye siyasî çawa dikarin ziyên wan veqetiyanan kêmtir bikin? Erk û wezîfeyên partiye siyasî û civatên xelkê Kurdistanê di vê derbarê de çi ye?

M. Hicrî: Spas, pirsêke bi cî bû. Cudabûn di nav partî yan girûpekê de tişteke çavniherkirî û xwezayî ye. Tişteke normal e ku girûpek bi partiyeke re ku bi hev re xebitîn, li hev nekin û ji van veqetîn. Serbarê vê yekê ku hem me û hem xelkê Kurdistanê û tev dilsozên Kurd bi bûyerên han pîr xemgîn bûn, nemaze ew cudabûna ku di nava Partiya Demokrat de pêk hat, divêt eva ji bo xelkê Kurd tişteke çavniherkirî be. Nemaze di nav partiye demokratîk de, ji ber ku li wir gotûbêj, nîqaş, diyalog û rexnegirtin heye, tişteke xuristî ye ku ji ber ku li hev nakin û nikarin bi hev re bixebitin, ji hev cuda bibin. Ez haşayê ji vê yekê nakim ku ev yeke hêza Kurd jar û qels nake, lê her dem ne wisa ye. Divê xelkê Kurd vê rastiya tal bipejirînin û bizanin ku îmkanê cudabûnan di nav partî û girûpên siyasî de heye, ji destpêkê ve hebûye û di pêşerojê de jî dê hebin. Pîrsa sereke eva ye, em çi bikin ku ziyân û xisarên vê yekê kêmtir bikin, bi raya min eva xala bingehîn a vê pîrsê ye.

Di vê navberê de hinek erk û wezîfe hem dikevîne stûyê rêberê partiye siyasî û hem

jî gel. Divêt rêberên partiye siyasî ên Kurdistanê bi xwe pêrewiyê ji qanûnê bikin, dema partî qanûnekê ji xwe re didanê, ew yasa ji hinek pîrensîpên demokratîk û exlaqî pêk tê ku divêt wan biparêzin.

Dema ku girûpek ji partiyeke vediqetin, ne qeydî ye, madem ku cuda dibe, partiya han napejirîne, partiyeke din ava dikin, bila naveke din ji xwe re hilbijêrin, di bin dirûşm û sembolên din bixebite, heke bi vî awayî be, divêt girûpa eslî ku cudabûn tê de pêk hatiye, pêşwaziyê ji vê gavê bike û alîkariyê jî pê re bike. Bi baweriya min eva ne tenê xisarên cudabûnan kêmtir dike, belku dê bikaribe hêza Opozîsyonê jî xurttir bike. Ji aliyê din, bi hizra min di vê derbarê de hinek erk dikevîne stûyê xelkê jî. Heke me heq gotibe, gelê Kurd di Rojhlatê Kurdistanê de li koma wan veqetiyanan ku aliyê kêmtir piştî damezrandina Komara Îslamî a Îranê di nav PDK Îranê de pêk hatine, gellek jîr û bi wêrane biryara xwe dane. Divêt gel zûtir û bilez biryara xwe

M. Hicrî: “Ez bawer im niha xebat û berxwedana Kurdan di hemû beşên Kurdistanê de gellek armancdartir, bawermendtir û bi têdîtin û hûrbîniyeke zêdetir pêşde diçe”

bidin, kesek ku li gor qanûn û biryarên demokratîk ku di partiyeke de heye, neparêze, eva kareke nebaş e, zûtir biryara xwe li ser bidin. Bila raya giştî ya gel dadweriyê li ser pîrsan bike, renga wê demê kes yan girûpek ku dixwaze cuda bibe, bi têdîtin û dahûrandineke zêdetir ve veqete. Ji ber xwestek û daxwazên xwe derbeyan ji tevgera gelê Kurd nede û xelkê tûşî xem û nerehetiyên bike.

Niha Partiya Demokrat di Îranê de, ne partiyeke legal e, lê li wan cihên ku PDK Îranê bi awayekê di hevpewendiya navneteweyî an navçeyî ên weke Enternasyona Sosyalîs, Kongreya Neteweyên Îrana Federal yan UNPO'yê de ku PDK Îranê di wan de endam e û bi fermî hatiye veqetiyane çûne wan cihane, lê ji wan re gotine hûn ne Partiya Demokrat in û heke hûn bixwazin bibin endam, divêt hû sembol û navê xwe biguherînin, lê mixabin em dinêrin wan hêj ew kare nekiriye, serbarê vê yekê ku cudabûn tişteke xwezayî ye, di Rojhilata Navîn û welatên Ewropayê jî di nava partiya çê dibe, raya we di vê derbarê de çi ye?

M. Hicrî: Ew rêxistinên navneteweyî ku we qala wan kir, ji xwe re qanûnek hene û bi hemû awayekê qanûnên xwe diparêzin. Wan rêxistinan li gor qanûnan bersiva daxwaziya hevalên me ên berê ku ji me

veqetiyane, dane. Ji wan re gotine demekê endambûna we dê bikeve ber lêkolîn û nirxandinê ku divêt hûn weke partiyeke cuda û serbixwe ji nav û hemû sembolên PDK Îranê ku niha di wan rêxistinan de endam e, xwe binasînin. Ez bawer im heke ew wî karî bikin, dê qazanc bikin.

PKD Îranê ber bi Kongireya Çardehem a xwe diçe, bi raya we çavniheriyên xelkê ji wê Kongireyê çi ne û PDK Îranê dixwaze di vê Kongireyê de çi bike û ji piştî Kongireyê re çi bername û programek heye ku bike?

M. Hicrî: Komîteya Navendî a PDK Îranê biryar girtiye ku îsal Kongireya 14^{hem} ya partiye lidar bixe. Ji bo vê yekê çend şandên amadekar ji bo berhevkirina kar û barên Kongira 14^{hem} pêk hatine û karê wan ber bi dawiyê diçe.

Ji ber hinek pirsgrêkên hundirîn, me nekarî hemû armancên Kongireya 13^{hem} a xwe bicî binin, bêguman yek ji karên bingehîn ên Kongireya me ya Çardem, domandina kar, xebat û projeyên paşdemayî ên Kongireya Sêzdehem in ku armancên gellek bilind û pîroz in. Bêguman ji bo ku em bikarin bigihîjin wan armancan, renga hinek guhartin derkevin holê, eva ez vîra bas dikim, nêrîna min ya şexsî ye.

Bo mînak, divêt em çi bikin bona vê yekê ku pêkhatiya rêberiya Partiya Demokrat biguhere, ku bikaribe baştir kar bike ji bo ku bigihîje wan armancan ku Kongireya 13^{hem} diyarî kiriye. Gelo di bername û pêrewa hundirîn de hinek xalên jar û lawaz û asteng hene ku em bikarin biguherînin, em dê çawa bikarin hejmareke zêdetir ji vê qasa ku me berê hebûye, ciwanan binin nav rêberiya partiye. Jinan beşdarî rêberiya partiye bikin di asta rêberî û berpirsiyariyê de. Me ji bo zindî ragirtina pêvajoya xebatên Kongirê, ji bilî ew heyetên ku me di nav partiye de diyarî kirine, em bi komek xelkê pîspor û zana li hundirê welat û derve kar dikin ku di raderbirîn û dengdana li ser pîrsan beşdar bin. Me biryar girtiye ku civîn û semînar li ser pîrsên Kongirê pêk binin û gotûbêj û nîqaş di vê derbarê de bihên kirin. Me di malpera navendî a partiye (Kurdistanmedia.com) de kuncêk taybet ji bo Kongireyê vekiriye û em li wir nêrînên xelkê bi awayekî azad diweşînin û em gellek bernamêyên din ên taybet ji bo dewlemendkirina Kongira 14^{hem} rêve dibin.

Rêzdar Mistefa Hicrî, gellek sipas ku te dema xwe ji me re veqetand û pîrsên me bersivandin.

M. Hicrî: Ez jî sipasiya we dikim, serkevtinê ji we re û serfiraziyê ji gelê Kurd re hêvî dikim. Ez daxwaz dikim ku gelê Kurd wekî berê bi awayekê çeleng di basên PDK Îranê de beşdar bin, me rexne bikin, pêşniyarên xwe ji me re bişînin û rênîşaniya me bikin, ji ber ku PDK Îranê xwe weke partiya gelê Kurd dizane û bi nêrîn û dîtînen wan dewlemend dibe.

Bizava Neteweyî A Kurd Ji Nêrîna Dîroka Siyasî Ve

Beşa 2

Bêhzad Xoşhalî *

Wergeran ji Farsî/ Omîd Esxeran

Gellek dîrokzan, serhildana Şêx Ubeydulayê Nehrî weke destpêka nasyonafîzma nûjen di Kurdistanê

de dihesibînin. Serhilanana han ji ber nasname û taybetmendiyên xasmanî bixwe ku ew ji serhildan û bizavên berî xwe cuda dike û nêzîk bizavên piştî xwe dike, xwediyê girîngiyek taybet di dîroka siyasî a neteweya Kurd de ye. Li gor şiroveya pêşîn ji beşa berê a vê nivîsarê, di destpêkê de em dê bersiva pênc faktera bidin û piştê dê nihêrînek kurt li ser bizavê de bikin û di dawiyê de jî em dê qala hin taybetmendiyên wê bizavê bikin:

1- Kiryar: Bizava Şêx Ubeydula Nehrî
2- Sebeb: Hêzên çekdarên Kurd li ser sînoren Îran û Osmaniyê bi rêberiya Şêx Ubeydula Nehrî.

3- Biyav:

A): Dem: 1880 – 1881

B): Cih: Beşeke zaf ji Kurdistana Îranê û parek ji demografiyaya Osmaniyana.

4- Alav: Bizava çekdarî

5- Armanc: Hewl ji bo avakirina dewleteke serbixwe a Kurdî di nava çarçoveyek otom de.

Yek ji girîngtirîn sedemên pêkhatina serhildana Şêx Ubeydula Nehrî, hewl ji bo jîholêrakirina fîzîkî a Hemze Axayê Mengor ji aliyê hakimê Mehabadê ve bû. Bizava han di sala 1880'an Zayînî de dest pê dike û bo heyamê sal û nîvan di beşeke berçav ya Kurdistanê de, dom dike. Rêberiya wê bizavê xwediyê rûçikek olî – neteweyî bû û ji ber hêz û karîna olî a Şêx, xwediyê hêz û ptansyolek zaf ji bo berhevkirina hêzên Kurd li dijî hêzên Îran û Osmaniyê bû. Bizava han di heyamê gellek kin de, karî beşeke berçav ji Kurdistana Îran û herêmên ser sînoren yê Osmaniyana rizgar bike. Hêjayî gotinê ye ku hêzên Şêx nêzîkî dagirkirina Teverêzê jî bûn, lê di dawiyê de diplomasiya çalak a Bîrîtaniya û Rûsiyayê, gotûbêjên Îranê û Osmaniyana û pêkhatina hin pirsgirêk û kirzan di nava hêzên Şêx de, ew ber bi paşdekişyanê hay dan û di sala 1881'an a Zayînî de, bi dîrxistina Şêx Ubeydula Nehrî, hêdî hêdî bizava han qels û lawaz bû.

Şêx Ubeydula Nehrî ji yekemîn rêberên Kurd yê piştî sala 1639'an û dabeşkirina Kurdistanê ye ku di pêwendiyên navbera xwe û balyoz û nûnerên Bîrîtaniya, Bab Ali(Osmanî) û Tehranê de, qala mafê Kurdan ji bo diyarîkirina çarenivîsa xwe dike û bi bikarbirina hin peyvên weke "neteweya Kurd", "Mafê Kurdan ji bo hilbijartinê" û di dawiyê de "Mafê avakirina dewleteke serbixwe a Kurd", taybetmendiya neteweperwerî a Kurdan bi ronî, eşkere û nişan dide. Navhatî her wiha ji yekemîn rêberên Kurd tê hesabandin ku



* lêkolînan û nivîskarê ciwan yê Rojhilatê Kurdistanê

serbarê bîr û baweriyên olî yê xwe, karî rûçikek neteweyî jî bixwe ve bigire û hemû hêza olî a xwe ji bo neteweya xwe bikar bîne.

Ji hin taybetmendiyên din yê wê bizavê, em dikarin qala yekbûna neteweya Kurd di bin rêberiya Şêx Ubeydula Nehrî de, nenasîna sînoren nava du dewletên Îran û Osmaniyana ji aliyê Kurdan ve û li cem hev kombûna Kurdên du aliyê sînora ji bo gihîştin bi armançeke hevbeş bikin.

Lê girîngtirîn taybetmendiyên bizava Şêx Ubeydula Nehrî pêkhatî ne ji:

1- Rêberiya olî – neteweyî a Şêx Ubeydula Nehrî di destpêka bizavê de.

2- Guhartina wê rêberiyê bi rêberiyek neteweyî di doma bizavê de.

3- Berfirehbûna çarçoveya demografîk a bizavê.

4- Bihevrebûna bihêz a Kurdan di bin rêberiya Şêx de.

5- Beşdariya Kurdên her du aliyê sînora di bizavê de.

6- Diplomasiya çalak a Şêx di dema bizavê de, hevdem tevî zirûfa diplomatîk a Bîrîtaniya – Îran û Osmaniyê.

7- Îşarekirin bi mafê diyarîkirina çarenivîsa Kurdan ji rêya bikaranîna hin peyvên weke "Mafê diyarîkirinê", "Vîn û îradeya hilbijartinê" û wd...

8- Hesibandina eyan û eşkere a Kurdan weke neteweyekê.

9- Bi fermî nenasîna sînoren Îran û Osmaniyê ku Kurd dabeşî ser du dewletan de dikirin.

10- Îşarekirin bi mafê neteweya Kurd ji bo avakirina dewleteke yekgirtî a Kurdî di gotûbêjên bi balyoz û nûnerên Bîrîtaniyayê re.

11- Nigeraniya Rûsiya û Bîrîtaniyayê ji îmkana û keysa serkevtina şoreşa Şêx Ubeydula û guherîna sînora bi avabûna dewleteke Kurdî.

12- Berdewamiya bizava siyasî a Kurdan serbarê serneketina tevgera çekdarî û bandorên wê li ser tevgerên piştî xwe ku renge dîrokzan gihandibin ser vê baweriyê ku tevgera Şêx Ubeydula Nehrî, destpêka tevgera Kurdan a neteweperwer di çarçoveyek nûjen de ye.

Komkujiya Sergerê

Mecîd Cinîkanlo

► Sedsala bîstana di dîroka Kurdan de, teji ye ji bûyerên dilêş ên weke Enfal, Kîmiyabaran, komkuji, wêran û kavilkirina gundan û bajarana.

Piştî şerê Çaldiranê, Kurdistan di navbera du dewletên Osmanî û Sefewiyana de hate parvekirin û piştî şerê yekem ê cihanê, Kurdistan bû çar parçe û di navbera çar welatên Turkiyê, Îran, Îraq û Sûriyê de hate parvekirin.

Gelê Kurd ku bi hezaran sal e xwediyê vî xak û nîştimanê ye, ji bo azadiya Kurdistanê herdem di halê serhildanê de bûye, her dem ji aliyê her çar dewletên dagirker ên Kurdistanê ve hatiye tepeserkin.



Bi hezaran gund li Bakûr û Başûrê Kurdistanê bi dest Bees û Kemalîstan wêran bûn, li parçeyên din ên Kurdistanê jî her bi vî awayî Kurd hatine/tên perçiqandin. Bi sedan hezar kes li Başûrê Kurdistanê ketin ber pêla nemirovane ya Kîmiyabaran û Enfalê, li Rojhilatê Kurdistanê bi sedan û bigire hezaran kes di girtîgehan de hatin îdamkirin û bi hezaran kes li gundê xwe hatin dîrxistin.

Ji bo serkutkirina Kurdan herdem çar dewletên dagirker bi hev re yek bûne û li hember Kurdan yek siyaseta bikar anîne.

Yek ji wan bûyerên tal û dilêş, komkujiya **Sergerê** di sala 1996'an de li herêma Mirgewer a Urmiyê ye.

Serger herêmeke çiyayî ye li zincîre çiyayê Zagosê di Rojhilatê Kurdistanê de ku dikeve nêzîk çiyayê Xelîl li rojavayê gundê Rajanê(gundek ser bi bajarê Urmiyê). Devera Serger weke beşek ji sînore navbera Îran û Turkiyê tê nasîn.

Demêke dûr û dirêj e ku Serger ê bûye cihê zozanê xelkê deverê û bi taybet xelkê gundê Rajanê. Piraniya xelkê gund mijûlê karê pezdariyê ne. Her sal di demsala biharê de xelk ber bi Sergerê dimeşin û heya hatina sir û seqemê li wir dimînin. Debara jiyana xelkê pezdar yê wir ji rêya firotina berhemên ku bi şîr çêdibin, re derbaz dibe.

Sala 1375'an a Rojî (1996), di serpehatiya xelkê Rajanê de saleke reş û dilêş e. Di bihara sala 75'an a Rojî de pezdaran vî gundî weke her sal ber bi Sergerê dikevne rê da ku ji bo demsala

zivistanê bikaribin debarekê ji bo jiyana xwe bi dest bixin, lê mixabin tûşî bûyereke nemirovane dibin. Mehekê piştî hatina gundiyan bo Sergerê, sibêdeya rojekê çend Helîkopterên arteşa Turkiyê bi ser devera han de difirin, xelkê wisa difikirî ku mêvan in, lê mixabin Helîkopterên Turkiyê bi awayekî nemirovane, mêvandarên xwe gulebaran kirin û kiryara han bû sedema kuştin û birîndarbûna çend kesan û Deşta Sergerê bi xwîna jin û zarokên bêgune sor bû.

Hêzên rejîma Komara Îslamî yên parêzerê sînor ku şahidê bûyera han bûn, mixabin pêşiya wê êrîşê nagirin. Gulebarana han dibe sedema şehîdbûna 6 kes (4 jin û 2 xort) û



Dîmenek ji gundê Rajanê

birîndarbûna 12 kesan.

Xelkê derdorê dema ku haydarê bûyera han dibin, ber bi gundê Rajanê diçin û hevderdiya xwe didin xuyakirin. **Şehrbanû Emanî** nûnera wê demê a xelkê bajarê Urmîyê di Meclîsa Şewra Îslamî de ji bo agahdarbûn ji bûyera han ber bi gundê Rajanê diçe û soza şopandina vê pirsê didê gundiyan. Lê mixabin pirsê Sergerê her di gund de dimîne/ma û tu car di Meclîsa wan ya Şewra Îslamî de nekete berbas.

Xelkê gundê Rajanê ku zanîn dewlet vê pirsê naşopîne, bi dilên xwe ên teji kul û kovan ber bi bajarê Urmîyê meşiyar û li hember balyozxaneyê Turkiyê meşeke nerazîbûnê lidar xistin û daxwaza qerebûkirina zirar û ziyane ji dewleta Turkiyê dikin.


Piştî çend mehan Komara Îslamî a Îranê ragihand ku arteşa Turkiyê devera Sergerê bi şaşî li cihê binkeyên PKK'ê gulebaran kiriye û eva di halekê de ye ku rejîma Îranê li hember parastina can û malê xelkê deverê berpirsîyar e.

Êdî ji bo xelk eyan e ku kuştina Kurdan ji aliyê Turkiyê ve be an rejîma Îslamî a Îranê, ji bo dagirkeran ne girîngiyek e.

Her sal di salvegera komkujiya Sergerê de, xelkê deverê serdana malbatên wan şehîdan dikin û hevderdiya xwe nîşanî wan didin. Em di 12'hemîn salvegera komkujiya Sergerê de, kiryara arteşa Turkiyê li Sergerê mehkûm dikin û hevderdiya xwe bi xelkê Rajanê re û nemaze malbatên goriyê wê cinayeta han radigihînin.

Navê şehîdên Sergerê ev in:

1. Hemaîl Hemîdî, jidayîkbûn, sala 1337'an a Rojî
2. Şemsedîn Qeyteranî kurê Hemaîl Hemîdî, jidayîkbûn, sala 1371'an a Rojî
3. Xedîce Qeyteranî, jidayîkbûyan, sala 1349'an a Rojî
4. Zehra Îranxah
5. Esmer Xîşanpûr
6. Mihemed Tahîrî



Şiroveya PeyvêSiyasî

Berhevkar: Omîd Esxeran

omid_anbi@yahoo.com

KAPÎTALÎZM

Têgiha Kapîtalîzmê ji peyva "Capital" bi wateya sermaye û heyînê hatiye wergirtin û ji sistemê re tê gotin ku xwedîtî û sermayedanî di warê alavên berhemanî de,

di bin destê hejmarek ji takekesên civakê de ye.

Her çend qonaxa Kapîtalîzmê ji qonaxa Feodalîzmê pêşkevîtir e, lê çewisandin di vê qonaxê de bitirstir e û mifah û sûdwergirtin ji keda zehmetkêş û şênîyan zêdetir e. Ji ber ku alavên berhemanî pêşkevîtir dibin, sûd ji teknîka pêşkevî tê wergirtin û eva jî dibe sedem ku di dawiyê de xwediyên kargehan berhemên cur bi cur berhev bikin û bi vî awayî qazancek zêdetir destê wan dikeve. Derheq alavên berhemanî de serdemê sermayedariyê de, çend qonaxên ji hev cuda di holê de hene ku emê gellek bi kurtî qala wan bikin. Di qonaxa yekem de kargeh xwediyê şeklek destpêkî in û bi awayekî hevkarîkirinê "Cooperation" ji aliyê çend kedkarên sade ve tîrêbirin, di qonaxa duyem de kargeh ji qonaxa yekem pêşkevîtir in û hewcehî bi kesên pîspor û şareza hene û her karek divêt ji aliyê kesên şareza ve bihên encamdan, di qonaxa sêyem de kargeh di warê pêşxistin û teknîkê de pêşkevîtir in û berhem ji rêya maşînen pêşkevî ve tîrêbirin.

Di zirûfek wiha de mercên cur bi cur di civakê de pêk tîrêbirin û kedkar û zehmetkêş bi awayekî bixof tîrêbirin ku di encama vê çendê de jî dijheviyek kûr di navbera texa kedkar û xwediyên kargeha û karxaneyan de derdikeve holê.

Di warê dîrokî de, geşekirina pêwendiyên berhemanîna sermayedariyê li Ewropaya rojava ji sedsalên navîn ve dest pê dike, lê berhemanîna ji rêya makînan di dawiyê sedsala 18'an û destpêka sedsala 19'an de dest pê dike. Kargeh pişt bi makîna û teknîka pêşkevî û pişesaziyê girê didin û cihê kargehên destî (mano faktor) û kargehên pêşeyî digirin. Di warê cotkariyê de jî dezgehên mezin ên sermayedariyê tîrêbirin damezrandin ku tê de karkerên rojane bi makînen cotkariyê kar dikin.

her weke ku ji navê wê re dixuye, pêkhatî ye ji qatek xwedî milkên zaf, bi liberçavgirtina vê çendê, civakên ku ji sermayedariya biçûk pêk hatine, weke civakên kapîtalîst tîrêbirin. Li gor nêrîna Marksîstan, sermayedar bixwe delîveya jînavçûna xwe pêk tîrêbirin û hevdem tevî pêşkevîna pişesazî û teknîkê, rewş û zirûfa texa kedkar û zehmetkêşan roj li pey rojê berbi xirabûnê diçe û bi vî awayî dijheviyek mezin derdikeve holê. Borjuvaziya biçûk jînav diçe û kedar û zehmetkêş jî zizan û destkurtir dibin û ji ber kirîz û qeyrana serhildana zehmetkêşan, sistema sermayedariyê sist û lertzok dibe û dewsa wê sermayedariyê dewletî ava dibe ku li ser bîngeha xwedîtîya hemû alavên berhemanîna hatiye damezrandin.

Çavkanî:

(Fehngî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî

(Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary" Daryûş

Aşorî

Li Hin Deverên Rojhilatê Kurdistanê Keç Tên Sinetkirin

Amadekar/ Hemîd Muxtarî

Mijara sinetkirina keçan, yek ji wan pirsan e ku weke binpêkirina mafê mirovan tê hesabandin.

"Radio Farda"yê di raporekê de derheq vê çendê ragihand: Civata Çandî- Civakî ya Jinên Azermêhr a Kurdistanê, di daxuyaniyekê de, serbarê piştevanîkirin ji daxwazên giştî yên jinan bona guhartina ferq û cudahiyên li dijî wan di yasayên Komara Îslamî a Îranê de, îşare bi taybetmendiyên pirsên jinên Kurdistanê Îranê kir ku yek ji wan taybetmendiyên sinetkirina keçan di hinek deverên Kurdistanê Îranê de ye.

Li gor rapora "Radio Farda"yê, sinetkirina keçan xincî Kurdistanê di parêzgeha Xozistanê de jî weke deb û edetke kevn tê birêvebirin.

Nigîn Şêxulîslamî, rojnamevan û berpirsa Civata Çandî û Civakî a Jinên Kurdistanê, (Azermêhr) di daxuyaniyekê de serbarê ragihandina nûçeya sinetkirina keçan di Kurdistanê de nivîsand: "Sinetkirina keçan yek ji curên tund û tûjiya veşartî tê hesabandin û keç bûne goriyê deb û edeta han a kevnşop.

Navhatî ku Kurd û ya bajarê Sine ye, ji "Radio Farda"yê re got: Ez bi nişkêve tevî pirsê sinetkirina keçan berbirû bûm.

Nigîn Şêxulîslamî di vê derbarê de dibêje: "Ez tevî vê pirsê nenas bûm û min nedizanî ku di Kurdistanê de jî pirsêke wisan heye, lê dema ku min ji bo lêkolîna civaknasî a jinên Kurd, serdana deverên cur bi cur yên Kurdistanê kir, tevî pirsê han berbirû bûm.

Nigîn herwiha zêde dike û dibêje: Min pirsê sinetkirina keçan di devera



Hewramanê de ku hem xelk û hem mêtîneya çandî û dîrokî wê tevî deverên din yên Kurdistanê gellek biferq e, dît.

Şêxulîslamî zêde dike û dibêje: Hewraman devereke olî ye û xelkê wê dibêjin ku sinetkirin, deb û edeta Hezreta Ayêşe û Fatimê ye, eva jî di halekê de ye ku tu keçek ji encamên xirab yên sinetkirinê agahdar nînin.

Li gor gotîna Nigînê, ew jinên ku karê sinetkirinê encam didin û ji aliyê mêran ve tînin piştgirîkirin, hêj ji wan nexweşiyên ku bi vê sedemê tûşî mirovan dibin ne agahdar in.

Mala we îdî ne paqij e!

Çalaka Mafê Jinan, Nigînê derheq nêrîna xelkê li dor ew bav û dayîkên ku keçên xwe sinet nekirine dibêje: Hejmarek ji mêrên îroyî hatine bal min û gotin seba vê çendê ku me keçên xwe sinet nekiriye, xesûya me serdana mala

me nakin û dibêjin mala we nepaqij e!

Sinetkirina keçan dibe sedema lewçenebûna wan!

Nigîn Şêxulîslamî, çalaka mafê jinan herwiha dom dike û dibêje: Yek ji wan jinên ku keçan sinet dike, ji min re got: Hinek mêr hatine bal min û ji min re gotin ku sinetkirina keçan, wan weke mêran perwerde dike û dibe sebeb ku keç lewçe nebin.

Şêxulîslamî dibêje: Temenê mêrkirinê di Hewramanê de gellek kême e. Dema ku keçek di temenê 17 saliyê de dizewice, sinetkirina 5 yan 6 salên berê bi bîr tînin.

Saziya Tendurustî a Cihanî li Hezîrana sala 2006'an di raporekê de ragihand: Keçên ku tînin sinetkirin di pêşerojê de tûşî pirsgirêkan dibin û renga di dema zarokbûnê de, ew yan zarokê/a wan canê xwe ji dest bide. Herwiha hezkirina wan a cinsî jî bo herdem dimire û ji nav diçe.

Li gor rapora Navenda Nifûsê a ser bi Saziya Neteweyên Yekbûyî, sinetkirina keçan zêdebarê vê çendê ku êş û azareke zaf heye, belku hinek caran dibe sebebê xwînrêjî, çilk û heta mirina wan.

Nigîn Şêxulîslamî, serbarê îşarekirin bi rola dewletê bona pêşgirtin ji sinetkirina keçan, got: Bi dabînbûna zirûfekê ku hem mafên civakî a xelkê tê de bê berçavgirtin û hem azadî hebe, mirov dikare wan pirsan çareser bike.

Pêka gotina karnas û pisporan, pirsê sinetkirina keçan ji baweriyên olî û deb û edetên xelkê çavkanî digire û bona pêşgirtin û ji navbirina vê pirsê bi awayekî yekcarî, hewceyî bi çalakiyên çandî û saxlemî yên dirêjheyam heye.

Navendên Parêzerê Mafê Jinan û Mafê Mirovan, kiryara sinetkirina keçan weke metodeke tund û tûjiyê li dijî wan



Hana Ebdî, Bi 5 Sal Cezayê Girtîgehê Hate Mehkûmkirin

Hana Ebdî, çalaka mafê jinan ji aliyê Taya 2 a Dadgeha Şoreşa Îslamî a Sine bi 5 sal cezayê girtîgehê û dûrxistin ji bo zîndana

"Girmî" a Azerbaycana Rojhilat hate mehkûmkirin.

Nûçegihaniya Rêxistina Mafê Mirovan li Kurdistanê di vê derheqê de ragihand: Navhatî bi buxtana lidarxistina civînan û hewldan li dijî ewlehiya netewî, li gor Madeya 610 a Yasaya Îslamî bi 5 sal cezayê zîndanê û dûrxistin ji bo girtîgeha "Girmî" hate mehkûmkirin.

Hana Ebdî di Çiriyê Pêşîn a sala borî li Sine hate girtin û niha di girtîgeha giştî a bajarê Sine de ye.




Mihemedsidîq Kebûdvend Bi 11 Sal Cezayê Girtîgehê Hate Mehkûmkirin

Mihemedsidîq Kebûdvend Serokê RMMK'ê, ji aliyê taya 15 a Dadgeha Şoreşa Îslamî bi tawana damezrandina Rêxistina

Mafê Mirovan li Kurdistanê bi 11 sal cezayê zîndanê hate mehkûmkirin.

Nesrîn Sitûde, yek ji parêzerên Kebûdvend, serbarê ragihandina vî nûçeyî, got: "Parêzerên doza han ji dana vê biryarê nerazî ne û qirar e di heyama 20 rojên pêşîn de nerazîbûna xwe



derheq biryara han eyan bikin û hêvîdar in ku dadgeha pêdeçûnê, vê nerazîbûnê berçav bigire.

Li gor gotina Stûde, mehkûmkirina Kebûdvend bi 11 sal cezayê zîndanê bi tawana belavkirina hizrên xwe, tevî mafê mirovan û peymannameyên mafê sivil û siyasî dijberî heye.

Li Îranê 114 Zarok Li Benda Îdamê Ne


► Kampayna Navneteweyî a Parêzerên Mafê Mirovan li Îranê ragihand: Li heyamê 10 salên borî heya niha, dezgeha dad a rejîma Komara Îslamî a Îranê biryara îdamê ji bo 177 zarokên bin 18 saliyê daye derkirin. 34 kes ji wan heya niha hatine daliqandin û 144 kesên din li benda birêveçûna biryara îdamê ne.

Kampayna han, roja sêşem, 17.06.2008'an, di daxuyaniyekê de navê 114 zarokên tawanbar yê benda îdamê weşand. Biçûktirîn zarok di nava wan 114 kesan de, **Ehmed Newrozî** ye ku temenê wî 12 sal e. Navhatî sê salan berî niha li Sîstan û Belûçistanê bi cezayê îdamê hatiye mehkûmkirin.

Saziya Efûya Navneteweyî di vê derbarê de ragihand: Em tenê carekê û bo cara dawîn daxwazê ji Îranê dikin ku

cezayê îdamkirina zarokan bisekinîne.

Hêjayî gotinê ye ku rejîma Îranê Carnameya Mafê Zarokan îmtiza kiriye û pêka carnameya han, îdamkirina zarokan qedexe ye.



Rojeva Civakê

Di Salê De Li Îranê 500 Ton Madeyên Bêhişker Tê Bikaranîn

Agirî- Beşa Civakî

► 26'ê Hezîrana 2008'an, Roja Cîhanî a Xebat Li Dijî Madeyên Bêhişker bû. Bi vê hencetê, Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, **Ban Kî Mon** daxuyaniyek da çapemeniyê û ji welatên cîhanê xwast ku ji bo çêkirina çîhanê aram û paqij, berpirsariya xwe li hember berlêgirtin û kêmkirina xesarên civakî û aborî ku madeyên bêhişker ji civaka mirovahiyê didin, bixebitin. Neteweyên Yekbûyî di rapora xwe a sala 2008'an, derbarê madeyê bêhişker, diyar dike ku di salê de 200 hezar mirov ji ber bikaranîna madeyên hişber jiyana xwe ji dest didin. NY dibêje ku bikaranîna madeyên hişber di cîhanê de roj bi roj zêdetir dibe.

Bengbûn bi madeyên sirrker weke nexweşiyêke civakî tê hesabandin ku encamên wê yên cismî û pîskolojîk heye. Bengbûn bi madeyên hişber yek ji arîşe û pirsgirêkên herî girîng ên civakî, aborî û tendurustiyê ye ku encamên nebaş û bi xeter ên vî gefeke micid û mezin bo ser civaka mirovahiyê tînin hesabandin û dibe sedema xesar û ziyarên civakî di warên cur bi cur de. Herwiha encamên neyînî û wêranker ên wê, delîveya tunebûna silametiya civakê bi awayekî micid gellek ji nîrx û bihayê çandî, civakî û sîncî dixê ber şopa xeter û tehlûkeyê.

Bengbûn bi madeyên hişber, bêtirî milyarek ji endamên malbatên bengdar di cîhanê de bi awayekî rasterast tevî pirsgirêkên vî xesar û nexweşiyê civakî rû bi rû kiriye. Madeyên bêhişker bîngeha qewimîna pîrr tawan û kiryarên biyom ên civakî wekî kuştin, dizî, tecawuz û wd... in.

Îran yek ji wan welatên Rojhilata Navîn e ku herî zêde goriyên bengdar hene û rêxistineke kar û barên civakî a Komara Îslamî eşkere kir ku di salê de bengdarên Îranî 500 ton madeyên bêhişker bikar tînin û bengbûn bi madeyên bêhişker xisara herî mezin a civaka Îranê pêk tîne. Hejmara bengdarên madeyên hişber li Îranê her roj zêdetir dibe û niha herî zêde Kirak û Hiroyîn a bi qasê %100 tê bikaranîn û kêşandin. Niha tenê di Parêzgeha Azerbaycana Rojavayê de 12000 Bengdar hene ku salê 4 heta 5.5 ton madeyên bêhişker bikar tînin.

Rojhilatê Kurdistanê ji vî rewşê ne bi dûr e, bengbûna xelkê û nemaze ciwanên Kurd di vî perçeyên Kurdistanê yê bin desthilatdariya Komara Îslamî bêdadê dike û civaka Kurdistanê a vî parçeyî bi tundî di bin gef û hereşên xurt de ye. Ji navbirina vî xeter û gefa mezin bo ser gelê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de, hewcedarê hest bi berpirsariyê nîştîmanî û hişyariya neteweyî ye.

ROJHILATA NAVÎN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Rojhilata Navîn, li gorî xwe li şerê sêyemîn ê cîhanê dijî. Pirsgirêkên civakên Rojhilata Navîn, wekî

gloka pirsgirêkan tê dîtin. Pirsgirêkên vê herêmê yên ku ketine ser hev û qet çareserî nedîtine, hemû civak zivêr û bêzar hiştine.

Îro ro, bi giştî hewcedariya tevê mirovahiyê belê nemaze jî hewcedariya gelên Rojhilata Navîn bi qasî nan û avê bi demokrasiyê rastîn heye. Ji ber ku pirsgirêkên demê û arîşeyên gerdûnî hemû li ser vê erdnîgariyê pêk tîne, divê çareseriyê mayînde û domdar jî pêşî li ser vê erdnîgariyê pêk were. Belê mixabin tu kes jidil xwe nadiyê û nêzikî çareseriyê manîdar nabe. Her kes jî çareseriyê dipelîkîne û di berjewendiyên xwe yên rojane û demdemî de difikire.

Dema ku gelên Ewropayê bi saya ronansê(ronîdariya demê) şoreşa hişmendiyê pêk anî, di rojeva Rojhilata Navîn de tiştekî wisa di rojeva gelan de tunebû. Şoreşa hişmendiyê ya Rojhilata Navîn, form û rêbazên rojava dişopîne, belê dixwaze naveroka wê li gorî rastîniya tijî bike. Pirsgirêkên Rojhilata Navîn gellek in. Belê derbirin û zanebûna van pirsgirêkan ne çareserî ye. Ji zanebûna pisgirêkan bêtir, hewcetî bi lêgerîn û çareserkirina wan heye.

Çareserî bi fêmkirin û têngihîştineke jidil a rabirdûya gelan a dîrokî û avakirina jiyana wan a îroyîn e. Ev yek jî bi pêkanîna ronansêke nû pêkan dibe.

Carekê di erdnîgariya Rojhilata Navîn de pirsgirêkên herî mezin dewletbûn û daxwaza dewletbûnê ye. Dewlet bi hezaran sal li ser çanda pedersahiyê ava bûye. Dewlet, ji do heta îro her car hebûna xwe spartiyê sê tiştên girîng. Yek; ol, du; pedersahî(mêrani), sê; nijadperestî.

Ev her sê hêz jî dijminê aştî, azadî û yeksaniyê ne. Heta ku ev her sê hêz an jî yek jî wan hebe, dê pirsgirêk jî bi hemû giraniya xwe hebin. Dewletên dinê hemû îro piştî xwe didin nijadperestiyê.

Li Rojhilata Navîn pirsgirêka herî mezin pirsgirêka malbatî ye. Malbat modela dewleteke biçûk e. Heta ku pirsgirêkên malbatî çareser nebin, pirsgirêkên herêmî û gerdûnî qet çareser nabin. Şaneya dewletê yek jê ol e. Nijadperestî jî şaneya wê ya nûjen e. Jin – Malbat – Mêr.

Ev her sê hêman wekî Sêgoşeya Şeytan a Bermûda ye. Bazar û siyaset,

malzaroka neteweyê ne. Ji bo civaka Rojhilata Navîn, pirsgirêka herî giran pirsgirêka netewe û neteweperestiyê ye.

Ji bo dewletan netewe, ji esasê etnîkî bêtir ji bo ku bingeha polîtîkayê pêk tîne, girîng tê dîtin. Birêvebirina dewletekê ya dûrî ol û nijadperestiyê ne gengaz e. Cihê ku ol lê hebe, hebûna terîqet û mezheban jî tiştekî pir asayî ye. Terîqet, riya parastin û jiyandina olê ya rêxistinî bi xwe ye.

Civaka Rojhilata Navîn, şaneya ripinî (hucreyê qurmî) ya hemû gelan e. Di herêmê de bandora hêjahiyên neolîtîk, bandora sê olên yekxwedayî û bichûbûna wan, bandora ol û baweriyê û hêza dahûrandina olê; her wiha bandora dîn û mezheban, hebûna qebîle û malbatê, her wekî pêwendiyên jin û mêr, siyaset, bîrdoz, sinc û exlaqê civakê û hwd. hemû bandorê li ser zêdebûna pirsgirêkan dike.

Divê ev pîrsa "Gelo çima hebûn û pêşveçûna hemû şaristaniyên dinê encam dide, belê ligel ku Rojhilata Navîn hem him û bingeh û hem jî dergûşa şaristaniyên dinê ye jî çima tu encamê nade?" were bersivandin. Di Rojhilata Navîn de tundwarî û desthilatdarî her gav li ser kar in. Û tu carî jî ser kar nehatine xwarê. Herdu jî girêdayî dewletê ne.

Bandora despotîzm, monarşîzm û şahînsahiyê(împaratoriyê) jî ser vê xakê kêmbûye. Di bingeha feraseta dewletbûnê de ev her sê tişt wekî sê hêzên jênager tîne dîtin. Qarîn(iqtîdar) û desthilatdariya siyasî jî bo dewletê wekî du birayên ducêwî ne. Hewldan û daxwaza desthilatdariyê şer bi xwe re tîne. Rê û rêbaza tundwarî û desthilatdariyê şer bi xwe ye. Tu dewlet nikare bê şer xwe li ser piyan bigire. Ji bo wê her dewlet, ji bo ku bikaribe her gav desthilatdariya xwe bidomîne dê şer derxîne; bikuje û bide kuştin. Ev şer jî pevçûn û hevkuştina gelan bi xwe re tîne.

Digel ku hemû gelên Rojhilata Navîn (û hemû gelên cîhanê) xwişk û bira ne jî dîsa dewletên vê erdnîgariyê wan bi hevdu didin kuştin û qirkirin. Çareserî demokrasî û aştîyê mayî de ye. Û ev jî bi hişyarbûna gelan pêkan dibe.

Kaniya Helbestan

Dilê Min



Dildar Îsmail

Dilê min kesera dikşîne
Qamişlo li bîra min tîne
Leylane dil hemû evîne
Şev derenge û roj xemgîne
Dil ji kerba te digrî
Erê dayê tu negrî

Evîn li te kirine pîvan
Demê vegeerî li me civan
Warê min ger hemû roj jiyân
Dûrbûna te windakir viyan
Dil ji kerba te digrî
Erê dayê tu negrî
Dilê birîndar derman nabe
Can û ceger li ba te mabe
Şevîn bê te wê çawa şabe
Jiyân bê evîn weha nabe
Dil ji kerba te digrî
Erê dayê tu negrî
Buhar şîn dibe bi hêstiran
Xwunav xweş dike bihna gulan
Awirên çava dikin lîlan
Her tû dimîne xewna şevan
Dil ji kerba te digrî
Erê dayê tu negrî
Ji dûrbûnê li şevê bake
Awazên xemgîn tu çêke
Helbesta evînê tu lêke
Silavê jînê tu birêke
Dil ji kerba te digrî
Erê dayê tu negrî

Qêrîna şevan pir di jware
Dilê reben her birîndare
Dûrim ji war roj li min are
Kaniya derda tim bê zare
Dil ji kerba te digrî
Erê dayê tu negrî
Xewneroj û her şev dibhure
Arê evîn qet na vemire
Erê dayê tu negrî

Dengê Rojava

Agirê Sînemeya Amûdê Hêjî Geş E!

Besam Mistefa



Zêdetirî 40 salan di ser agirê sînemeya Amûdê re bihurîn,

sedan zarokên kurd ku, pêseroja wan ji wan hate dizîn, hatin kuştin, hatin perçiqandin li kêleka Girê Şermolayê di bin axa ku ji asîmanê tawanbaran paqijtir û pîroztir e, dirêjkirî ne. Dilên dayikên wan ev 40 sal in mîna ku bi agirê sê dojehan bin, têne sotin: kezeb şewitîn, laş bûne ardûman, û bihn bi ser Amûdê ket, bihna kizirandin û kina bêhempa! Şermolayê



ji hingê ve bêdeng li laşên piçûk temaşe dike û ji xwe re dibêje: Ew çi dil bûn ên ku dikaribûn van dilên piçûk da nav êgir de bisojînin?!

Wê rojê, di salên 60'ê de ji sedsala bihurî, bi sedan zarokan berên xwe dane sînemeya bajêr a tenha daku li filmekî li ser şoreşa Cezayirê temaşa bikin. Nizanibûn ku çi li benda wan e... Dê çawa bizanibin û mêjiyê zaroktiyê pilan û kirêtiya mezinan bibîr nabe?! Dê çawa bizanbin ku welatê ew çûbûn da piştigiriya şoreşa wê bikin, piştî 15 salan planeke din ya giran û wêranker li birayên wan yên li aliyê din yê sînor girê bidin û hêj nizanin ku sînor yan welat çi ne?! Zarok bûn, bi ken û girinjînan berev sînemeyê ve diçûn daku tişteki nû bibînin û dema vegehin malên xwe, çirokê ji bav û dayikên xwe re biseridînin. Wê rojê, bajarê Amûdê çiroka xwe ya mezin ji erd û asîmanan re digot: li kurdan qewimî, mîna ku kurd ji êş û şewatan re hatibin afirandin...

sînemeya sêwî, ya teng û ne amade ji pêşkêşkirina mirinê pêve bû ejdeha û agirê xwe virde wirde belav kir û dest bi nêçîrkirina zarokên kurdan kir, weke dêwekî sêserî laşên nerm û piçûk daqurtandin, parçeyên laşên şewitî li wan deveran belawela bûn û yên ku xwe ji agir rizgar dikir û digiha derve, rastî "bîra qedrê" dihat û dibû para ava kûr.

Dengê zarokên xapandî bi ser amûdê ket, xirecir bilind bû, xelkên bajêr vecinqîn: "Xwedayê min, kurdên te ne ev, xwedayê min!" Bavê Mihemed yê ku bajêr pê hate naskirin, piştî şewatê berev sînemê ve çû. jêre gotin: qey zarokên te jî li wir hene? li wan vegehand: "Zarokên kurdan tev yên min in" û çû. pêşî polîsên ku dergeh li zarokan digirtin û qerebalix pirtir dikirin, bi tena xwe ji wir dûr kirin û xwe berda nav agir, çend zarok ji agir rizgar kirin û ji nişkê ve agir girte laşê wî... û ew di nav pencên xwe de quvaşt û ji hestiyar pêve tiştê nehişt.

Agirê geş dused ta sêsed zarokî nêçîr kir, ji bilî birîndaran. Wê rojê, bihna kizirandina laşê zarokên Amûda bavê Mihemed li seranserê bakur belav bû. Dûman jî heta çend rojan asîmanê deverê reş û xemgîn dikir, jixwe agirujên bajarê ku dor 30 kilomitir ji Qamişloke dûr e, tunebûn wê çaxê û heta ku laşên ter û nerm nebûne hestî ew negihîştin! Wê rojê, rondik hema hema ji çavan dihatine xwarê, dayikan pora serên xwe anîne xwarê li ser kezebên ku bi bereketa îdeoljiya faşîstên eflaq û beesê masûlke masûlke û parçe parçe hatine sotin û kuştin. Wê rojê, Xwedê ji jor li afirînerên xwe dimeyzand: Ma min wisa ji we re gotibû!

Wê rojê, girê Şermola yê ku dîroka Amûdê bi ax û bêdengiyê dinivîse, xwe negirt û heta jê hat hewil da ku xwe bighîne Amûdê û zarokên wê ji agirê bêbext xilas bike, lê zarok bixwe hatine nik wê û li kêleka wê heta haetayê xwe dirêj kirin: Êdî ji jiyana mezinên kirêt û pilanger xilas bûn, û niha dikarin bê tirs, bê agir û şewatan xewnên xwe bi teşiyên hêviyê bihînin.

Hevsera Hunermend Hesên Zîrek, Koça Dawiyê Kir

Roja îne, 20.06.2008'an, bêjera Radyoya Kurdî ya Tehran û Kirmaşanê û her wiha hevjiha

hunermendê naskirî yê neteweya Kurd, Hesên Zîrek, li bajarê Tehranê koça dawiyê kir.

Mîdya Xanim, dengê naskirî û berbiçav di nava qada edeb û wêjeya Kurdî de bû ku ji rêya radyo Kurdî ya Kirmaşanê û li rex dengê zelal yê Hesên Zîrek û bêjêrên weke



Şukrola Baban, Mihemed Kemanger, Ezîz Elewî, Perwîn Moşîr Wezîrî û Esed Serecedînî, xizmetek mezin bi peyvên resen yên Kurdî û wê radyoyê kir. Ew diya du keçan e û piştî mirina Hesên Zîrek heya daxistina wê radyoyê di sala 1360'an a Rojî de ev kar dom kir.

Koça dawîn û nemana Mîdya Xanimê, xem û kesereke mezin ji bo malbata ragihandina Kurdî ye. Lewra em jî weke rojnameya Agirî xwe di vê xem û kovanê de bi şîrîk û hevsoz dizanin û serxweşî û sersaxiyê ji malbata Zendî û hemû ew kesan dikin ku xwe bi xemxor û dilsozê edeb û wêjeya Kurdî dizanin.

CEJNA MUZÎKÊ

► 21'ê Hezîrana her sal (21/6) cejna muzîkê ye. Muzîkvanên cihanê bi gotina stran û jenîna muzîkê, vê rojê ji hev pîroz dikin. Cejna han bo sala 1982'an vedigere, dema ku Wezîrê Rewşenbîrî yê Fransayê (Jan Lok) biryara lidarxistina festîvala muzîkê da. Ji wê demê wir de ew cejna bûye edet û tîtalek salane û di gellek welatan de tê pîrozkirin.

Îsal li 110 welat û li 4500 bajarên cihanê de, bîranîna han bi awayek germ u gurr û bi xwerayî li ser şeqam, cihên giştî, hol û girtîgehên de hate pîrozkirin.

Bo yekemîn car, îsal di Herêma Kurdistanê de cejna muzîkê bi çend çalakiyan hate pîrozkirin.

Rewşa Wêjeya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê

Konê Reş

Bêgoman di van pazdeh-bîst salên derbasbûyî de, geşbûneke rewşenbîrî, serê xwe di nav me

Kurdên Binxetê de hilda bû. Ew geşbûn jî, di warê danheva zargotin û afirandina peyva kurdî a resen de bû û weşandina pirtûkên têvel û bi taybetî dîwanên helbestan.

Di vî warî de, em dibînin ku çapkirina dîwanên helbestan zoriya cuyreyên torevanî yên mayî biriye, wek: çîrok, şano û romanê...

Eger em stastîkekê di vî warî de çêbikin, emê bibînin ku pileya weşandina dîwanên helbestan bilindtîre ji cuyreyên torevanî yên din. Gelo sedem çîne ?

Eger em bersivê bidin, dibe ku gelek dilê xwe bigrin... Belê ta ku rastî neyê gotin, pêşketin rêka xwe di nav me de nabîne û em di pêvajoya xwe ya torevanî de nikarin rast û durist bilivin...

Me got cihê dîwanên helbestan bi gelekî bertîre ji cuyreyên mayî !

Lê gelo raste, ew dîwan helbest in?! û xwediyên wan raste helbestvan in ?!

Bêgoman helbestvan di nav wan de peyda dibin û têvelin, gava ku em wî nîfşê pêşîn ji vî mijara xwe bidin alî, ew nîfşê ku ji mêj ve bi rengê Cizîrî, Xanî û Cegerxwîn dinivîsin, yên ku em dixwazin li dor wan rawestin, ew nîfşê ku doh fêrî alfabaya Kurdî Latînî bûne û îro dîwanên helbestan çap û belav dikin, bê ku helbestên dîwanên wan şert û mercên dîwanên helbestan hilgirin.

Gotîneke Apo **Osman Sebrî** heye,

dibêje: *(Gelek ji xortên me çavên xwe berdana nivîsandina helbestan u ev ne tiştêkî hêjaye, di vî nivîsên rasteser bîn nivîsîn . Belê helbest tiştêkî ji edebêye, lê netevaya edebê ye. Divê ku mirov zanibe, bi zimanê xwe binivîsîne, lê nîzanim, hema ji min re helbestan çêdikin...)*

Ji kovara Pêşeng hejmara 5 / 1984).


Ez jî bi gotina rehmetyê Osman Sebrî re; lê em ne bi wan kesên ku navê nûjeniyê sehkirine û bihîstine, piraniya helbestên wan bi wî rengê nûjen hatine nivîsandin. Ew rengê ku xwendevan tê nagihêje û li ber nekeve ...

Helbestvanên me yên nûjen jî wisane, nîzanim helbestên kilasîk binivîsin, dibêjin: Em helbestên nûjen datînin, mane nûjenî pêşketina kilasîkêye, û nûjeniya ku ne ji kilasîk hatibe derê, dêmek ew nûjenî bêjî ye, bê esle, û em li torevaya resen digerin, torevaya ku kok û rehên wê di nav xaka me de kûr çûbe.

Ji rexekî din ve em bêjin nebêjin rewşenbîriya ku bi me re kom bûye, ji zimanê Erebiye, bi saya zimanê Erebi jî em serwxtî rewşenbîriya cîhanî bûne, Heger mirovek ji helbestvanekî ji terzê nûjen bipirse û daxwaza navê sê helbestvanên Erebi yên hevçerx jê bike, bê goman piraniya wan nîzanim, ji ber ku naxwînin, bi tenê navên çend kesên bi nav û deng bihîstine, wek Edonîs, Mehmûd Derwîş, Nîzar Qebanî û Beyatî... Ev navên ku pîreka min jî navê wan bihîstîye. Gerekê mirovê rewşenbîr, nemaze torevan, bi tevgera rewşenbîriya xwe re be, di wî welatê ku tê de dijî. Heger helbestvan be, gerek

helbestvanên hevçerxî xwe nasbike û helbestên wan bixwînin û weha jî kesên ku çîrok, şano, romanê dinivîsinin.

Ji sala 1990 î û virde, eve halê



Konê Reş

wêjeya kurdî di rojava de. Lê ji sala 2004 an û virde, rewş hat guherdîtin, ew kovar û rojnameyên ku bi kurdî di salên 1990 de, dihatin weşandin, êdî, em nema wan dibînin. Eger hebin jî, ji her salê hejmarek, an her du/sê salan hejmarek derdikeve, û dûrî şert û mercên rojnamevaniyê ne...!! Ji rexekî din ve, ya ku mirov sosretmayî dike, ew nivîskarên me, yên ku berê, tenê bi kurdî dinivîsandin, roja iro bi piranî berê xwe dane nivîsandina bi zimanê erebî. Ango hin bi hin zimanê erebî şûna zimmê kurdî digire û ev tiştêkî gelekî xerabe.. Bi gotîneke din; sal bi sal xwezî bi par.

Mixabin ew kovar û dezgehên ku dikarin bi karê xwe rabin nînin,

yên ku hene jî, nikarin, an ne li gor nivîsandinên me ne.. Kovara ku her salekê an du salan hejmarek derkeve, ez wê nabînim kovar...Hem jî ew dezgehên ku ji hina werê hene nînin. Vêca ji neçarî em berê xwe didin Kurdistanê Azad, kurdistanê bakur û nav kurdên sirgunê li ewrupa...hem jî ji neçarî em berhemên xwe yên ku em bi şevan di wan de dixebitin, di malperên Internêta de diweşînin.. ango westa me belawela dibe....Lê wek ku min got ziman û nivîsandina bi zimanê kurdî ketiye xwîna me de.. Em nikarin devjê berdin.. Eve rewşa me u wejeya kurdî li Binxetê.

36'mîn Salvegera Koça Dawîya Hunermend Hesên Zîrek

► 26'ê Hezîrana îsal, 36'hemîn salvegera koça dawî ya hunermendê binav û deng, **Hesên Zîrek** e. Mamostayê zana û dengê resen yê miqam û awaz û hunera rastîn ya kurdî, **Hesên Esedî**, naskirî bi **Zîrek** ku li bajarê Bokanê hatiye dinê. Ji yana zarokatiya xwe bi talî û nexweşî, xizanî û derbederiyê bi ser biriye. Dema ku 27 salî bûye, rû ji başûr kiriye û paşan çûye Kerkûk û Bexdayê û li wir dibe şagirtê hotelê û carna jî stranan distre.

Piştê ji ber dengxweşbûna wî li Radyoya Bexdayê bi mîaşê 6 Dînanan tê wergirtin. Hêdî hêdî û meh bi meh mîaşê wî zêde dikin û bi vî awayî heta çend salan di xerîbiyê de dimîne. Paşan di sala 1958'ê de vedigere Îranê û di Radyoya kurdî ya Tehranê de tê wergirdin û her li wir dest bi tomarkirina stranên xwe dike. Piştê tevî Mîdya Zendî hevnas û ji yana hevpar pêk tîne û dibin xwediyê du keçan bi navên Mehtab û Arizû.

Zîrek di sala 1962'ê de li Radyoya Kirmaşanê tê wergirtin û orkestrayêke muzîkê bi navê xwe ku jî 5 kesan pêk hatibû, ava dike.

Ew bi berdevamî û bi hevkarîya orkestraya xwe heya sala 1966'an stranan tomar dike. Paşan radyo ji ber tomarkirina zaf a stranan, mîaşê Hesên Zîrek qut dike. Kiryara han tesîrê ji ruh û derûna Hesên dike û radyoyê bi cih dihêle û vedigere bo Îraqê. Li Bexdayê bo heyamê 18 mehan tê girtin û piştî azadbûnê, dîsan vedigere Îranê. Ew car bi destê Sawak(İstixbarat) a Îranê tê girtin û piştî azar û îşkenceyek zaf serbest tê berdan. Paşan diçe bajarê Bane û li wir çayxaneyekê didanê. Dîsan li wir jî nikare bimîne û rû ji bajarê Şinoyê dike, heya sala 1972'ê û destpêka nesaxiya xwe(Penceşêra kezebê) her li wir staran tomar dike û kasetan diweşîne.

Zîrek ji bo çareserîya nesaxiya xwe diçe Bokanê û di operasyonêk neserkevî de ji yana xwe ji dest dide. Zîrek di 4'ê Pûşpera 1351'ê rojî (26.06.1972) de malavayî û xatira xwe ji kes û kar, huner û gelê xwe xwast. Li ser wesiya Zîrek, meytê wî li biniya çiyayê Naleşîkêne a Bokanê û li rex tirba



Çake Çikole tê weşartin.

Niha piştî borîna 36 salan bi ser koça dawî ya hunermend Hesên Zîrek, hêj nav û deng û ruh û rewanê wî li ba Kurdan e û stran û awazên wî jî xwedîka hest û xeyala parek ji xelkê Kurdistanê ye.

Rojnameya "New York Times":

"Bêtirî 10 Milyon Bengdar Di Îranê De Hene"

► Rojnameya "New York Times"ê derbarê rewşa xirab a bikaranîn û kêşandina madeyên bêhişker di Îranê de raporeke nû weşand û eşkere kir ku raporên dewletî didin diyarkirin, bêtirî 10 milyon bengdar (Mutad) bi tiryak, hiroyîn, Kirak, heşîş û cureyên din ên madeyên bêhişker di Îranê de hene.

Vê rojnamê di rapora xwe de diyar kir ku çavkaniyên ne fermî dibêjin ku hejmara bengdaran ji vê hejmarê gellek zêdetir e.

Vê rojnameya Amerîkî nivîsî ku berpîrsiyarekî Wezaretê Hundir a Komara Îslamî di konferansekê de di sala 2005'an de, da zanîn ku hejmara bengdarên ku madeyên hişber bikar tînin, ji 10 milyonî zêdetir e.

Di doma rapora vê rojnamê de hatiye ku 4 salan berî niha %54 ji bengdaran li Îranê **Tiryak** bikar dianîn, lê niha kêmtirî %30 ji bengdar vê madeyê bi kar tînin û herî zêde **Kirakê** bikar tînin.



Ji Aliyê Îdareya Ewlekarî A Bajarê Sine Ve, Parazîtên Berhemhêner Ên Penceşêrê Tê Belavkirin

► Îdareya Ewlekarî a bajarê Sine li Rojhilatê Kurdistanê ji rêya danîna dezgehên berhemhêner ên parazîtan li ser antênên şîrekata telefonê a "IRAN CELL"ê, tendirustiya xelkê vî



bajarê Kurdistanê(Sine) bi xeter û tehlûkeyê re rû bi rû kiriye.

Malpera Nûçeyan a "iranpressnews"ê, serbarê weşandina vî nûçeyî, nivîsî: "Şirketa "IRAN CELL"ê ku sîmkartên telefonên destan(Mobile) difiroşe, ser bi Wezaretê Ewlekarîyê ye.

Li gora agahiyên vê çavkaniyê, parazîtên vê dezgehê gellek xeter in û ji rêya wan mirov tûşî penceşêrê dikin û encamên neyênî û xisarên wan piştî çend salan xuya dibin.

Li gor rapora "iranpressnews"ê, ji bo xwe parastin ji ziyarên wan parazîtan, divêt xelk ji sîmkartên dayim mifahê werbigirin û kesên ku "IRAN CELL" jî hene, divêt wê şarj nekin.

Ev kiriyara rejîma Komara Îslamî a Îranê bona berlêgirtin ji belavbûna bernamêyên kanalên esmanî, nemaze yên Kurdî tê meşandin.

Lampa Elekterîkî Ya Herî Qedîm Ku Hêj Hilbûyî Maye

► Gellek tiştên ecêb û balkêş di cîhanê de diqewimin. Wêneyê ku hûn dibînin, lampê e ku di rawestgeheke trenê li Amerîkayê hatiye girêdan û ji sala 1901'an heta niha hilbûyî maye.



Ev lampe di pirtûka

rekordên cîhanê ya **Gîns** hatiye tomarkirin û ji bilî 2 caran ku ew jî ji ber çûna elekterîkê temirî ye, di heyamê vî 106 salî de herdem hil bûye.

Bo Cara Yekemîn Di Dîrokê De Taqîma Fotbulê Ya Jin û Mêrên Kurdistanê Beşdarî Dewreyeke Cîhanî Dibe

► Kûpaya Cîhanî a Fotbulê a bi navê VIVA ku dewreyeke cîhanî a lîstika topa pê ye û her du salan carekê ji bo wan gelan tê lidarxistin ku dewletên wan ên serbixwe tune ye. Bi vî awayî kêbirkêya werzîşî di navbera wan gelan de çê dibe.

Îsal lîstikên vê Kûpaya cîhanî a Fotbulê di navbera



rojên 7-13.07.2008'an li bajarê "Gallivare" yê hîlketî li bakurê Swêdê birêve biçin. Di Kûpaya VIVA 2008'an de, tîmên "Syriacs", "Padonien", "Samiland", "Provence" û Kurdistan beşdar bibin.

Lîstika vekirina kûpaya VIVA 2008'an de di navbera tîmên Kurdistan û "Samiland"ê de, roja 07.07.2008'an bê kirin.

Eva bo cara yekemîn e ku tîmên fotbula Kurdistanê bi awayekî

fermî beşdarî dewreyeke cîhanî a wiha dibe. Taxîma Kurdistanê bi 2 tîmên Jin û Mêran beşdar dibe.

Taxîma Fotbulê a Mêran a Kurdan ji Kurdistanê ve diçe Swêdê, lê tîma Jinan ji jinên Kurd ên Swêdê pêk tê û dê bi hevrikên xwe re dakevin lîstikê.

